14/79

ŞÊX EZEDDÎN HUSÊNÎ

Şêx Ezeddîn Husênî (di hevpeyvîneke bi Ş. B. Soreklî re :9/6/1988)

* Diyare, gelî Kurd li seretayî Îslam da, ku Îslam hatiwa, li gel Îslam bi şer hatiwa, şerekî zor gewre kirdiwe. Lê paşên, wextê ku bûye îslam û teslîm bûye zor baş Îslam qebûl kirdiwe. We di drêjî tarîx da milletî Kurd wek milletekî musilman hemîşe neqşî bûwe li xizmetî Îslam da, hem li naĥiyeyî mubareze kirdin li ew kesanî ziddî Îslam, hem li naĥiyeyî îlm, û ülemayî zor gewreyî, wek Îbnûssela, wek Îbnû Teymiye, wek peyayê zor gewre, ku xizmet bo Îslam kirdiwa, wek Şarezûriyekan ûhd. Ta ev roj Kurd beşek e ji camiëyî îslamî, û eger bête gotin, ew ji hemî milletekanî mentiqê musilmantir e û usûlî Îslam baştir ĥifiz kirdiwe , renge dûr nebî(mat memîn), çunkî alûdegî li nêv Kurdistan da zor kêm e û xurafatî mezhebî, wek di nêv Şî-ë de ye, ya li nêv Turkanî Osmanlî da heye, li Kurdistan niye. Kurd Îslamî rastî qebûl kirdiwe û xizmet jî bo kirdiwe. Mesela, Selaĥeddîn gewretiriyên xizmet bo älemî Îslam kirdiwa, ku bi ittîfaq Kurd bû. Ema îllet ew e, ku Kurd bo esasen îstifade nekirdiwe, ku bi navî xoy dewletek bo wî hebe, herwekî milletanî din.Tirk hatiwe gewretirên behrey wergirtiwe, Îraniyekan herweha, hemû pêkhatûn ĥikûmetiyan dirust kirdiwe, emma Kurd, bo? Kurd eslen ji tarîxî zor drêj da wek milletekî nehatûte kayewe,

راگەیاندنی شێخ عزەدینی حسێنی

* دیارە میللەتی کورد لەسەرەتای ئیسلامدا (کە ئیسلام هاتووە لەگەڵ ئیسلام بەشەڕ هاتووە) شەڕێکی زۆر تووڕەیی کردووە. لەپاشانا وەختێک هاتبێ بووە بە ئیسلام و تەسلیم بووە زۆر باش ئیسلامی قبوول کردووە. وە لەتوولی تەئریخدا میللەتێکی کورد وەک میللەتێکی موسڵمان هیچ نەقسی بووە لەخزمەت بە ئیسلامدا، هەم لەناحیەیی جیهادەزە کردنەکەگەڵ ئەو کەسانەی کە بەزدی ئیسلام بوونە هەم لەناحیەیی عیلم و سەوادەوە کە عوڵەمای زۆر زۆر تووڕەی وەک ئیبن وسەلاو ئیبن قەیم و ریجالی زۆر تووڕە کە خزمەتیان بە ئیسلام کردووە وەک شارەزووریەکانەکەی ئەوانە هەبوو. لەدوایشدا تا ئەوڕۆ کورد هەر وەک میللەتێکی موسڵمان بەشێکە لەجامیعەی ئیسلامی، وە ئەگەر بڵێین لەهەموو میللەتەکانی دیکە کەمنتیقەداهەن، لەهەموو موسڵمانەتر و ئوسوولی ئیسلامی پاشتر هیفز کردووە وەئەگەر نەبێ، چونکە ئالوودەگی لەنێو کوردستاندا زۆر کەمە خورافاتی مەزهەبیش وەک لەنێو شیعەدا یا لەنێو تورکانی عوسمانلیدا هەیە، لە کوردستاندا نیە. کورد ئیسلامی بە ڕاستی قبوڵ کردووە و خزمەتی پێ کردووە بەهیچ لایەنێکی ئیسلامدا وەک خزمەتی بە عالەمی ئیسلامی کردووە کە بە ئیتیفاق کورد بووە. ئەما میللەتی ئەوەی کە کورد بۆ ئەساسن ئیستفادەی نەکردووە لەوەی بە نێوی خۆی دەوڵەتی هەبێ هەر وەکو میللەتانی دیکەی هاوەرمیانە- تورک هاتووە گەورەترین بەهەیبەتی وەرگرتووە، ئیرانیەکانیش هەروا هەبوو پێکهاتووە حکوومەتیانە دروستا کردووە، ئەما کورد بۆ؟ کورد ئەسڵەن لەتەئریخی زۆر درێژدا وەک میللەتێک نەهاتۆتە کایەوە

yanê xo bi milletek bizanê, cuda li Faris, cuda li Tirk we Ereb, bi ew şêwe, wek millet xebatî xoy neniwandiwe. Îranî hatin ĥikûmet bi navî Îslam dirust kirdiwe. Meselen, Qacareyekan, Sefewiyekan, ema esasen navî Îslam bo wan metreĥi nebûwe; weke nuha jî dibînî, dewlete ërebiyekan, yan Xumênî, ya wane ku bi nêvî Îslam kardikin, lê Îslam û hedefî Îslam li wan da mewcûd niye(amancên Îslam li cem wan tune), ku ewana azadiyê û ĥiqûqî xelq bidin. Ya li ber ewe ye, ta wextek Îslam bo ewe bû, ku xelk lêyî behrewer bigrê û ĥukmatî xo pê dirûst bikat, her wekî ku Erebekan, Tirkekan, Farisekan bi navî Îslam ĥikûmetiyan dirust kirdiwe. Wê wextê Kurd xwe wek milletekî nenasiye. Wextek hatiy ku xuya bûye, eslen ew ĥukmatana hêçyan Îslamî nebûn. Xulase ew e, ku Kurd ta wextekî bo li Îslam behreberdarî biket û bi nêvî xo ĥikûmet dirust biket, xoy wek millet bi ĥesêb nehênawa(dema Kurdan dikaribûn ji Îslamê sûdê bibînin û dewleteke bi navê xwe çêkin, wan xwe wek milletekî neĥesibandine). Wextek jî hatiye xo wek millet biĥesibîne, ew ĥikûmetegewraney ku li dewr û ber bûn, zahiran musilman bûn, lê hëç ëhd û peymanekî Îslamî we însaniyan nebûwe, herxerîkî xwardinî milletî Kurd bûn.

* Hêzên siyasî îdyolojiyên wan hene; meselen li Kurdistanî Îran Hizbî Dêmokrat dibê: dêmokratî bo Îran û xudmuxtarî(otonomî) bo Kurdistan. Komele, Hizbî Komo-

یەعنی خۆی بە میللەتێکی بزانێ جودا لفارس
جودا لە تورک و عەرەب، بە و شێوەیە خۆی
نەنواندووە. ئێرانی هاتووە حکوومەتی بە
ئیسلام دروست کردووە. مەسەلەن
قاجاریەکان، سەفەویەکان ئەساسەن ئەوەی
ئیسلام بووە بۆیانە هەرگیز نەبووە ئەوە
ئەلعانیش دەبینی دەوڵەتە عەرەبیەکان یان
خومەینی یا ئەوانەی کە بە ئیسلام کار دەکەن
خۆ ئەوەی ڕاستی دەڵێن ئیسلام و هەر دەڵێ ئیسلام
لەوانداە مەوجود نیە بۆکە ئازادیە یا حقوقی خەڵقە.
یا لەبەر ئەوەیە تا وەختێک ئیسلام بۆ ئەوە بوو
کە خەڵکی لێی بەهرە وەربگرێ و حکوومەتی خۆی
پێ دروست بکات هەروەکو عارەبەکان، تورکەکان،
فارسەکان کە هەموو بە ناوی ئیسلامەوە حکوومەتیان
دروستکردووە. لەو وەختەدا کورد میللەتێکی
نەبووە ئادابێتەکایەوە. وەختێکیش هاتووە
کایەوە ئەسڵەن ئەو حوکمەتانە هیچیان بە ئیسلامی
نەبوونە. حوڵاسە ئەوەیە کە کورد تا وەختێکی
بووە لە ئیسلام بەهرەداری بکات و بە پێوەی
خۆی حکوومەت دروست بکات، خۆی وەک میللەت
بەحیسێب نەهێناوە. وەختێکیش هاتووە خۆی
وەک میللەت بە حیسێب پێنێ ئەو حکوومەتە
کە دانیشتووانی لە دەوروبەر بوونە، زاهیرەن
ئیسلام بوونە وەئیلا هیچ عەقدو پەیمانێکی
ئیسلامی و ئینسانیانە نە بووە هەر خەریکی خواردنی
میللەتی کورد بوون.

هێزە سیاسیەکانیشی لەبەر ئەوەی ئایدۆلۆجی
جیاوازیانە هەیە، هەسەلەن لە کوردستانی ئێران
حیزبی دیموکرات دەڵێ دیموکراتی بۆ ئێران و خود
موختاری بۆ کوردستانە، کۆمەڵە (حیزبی کۆمۆنیستی
ئێران) هەسەلەی تەبەقاتی زل دەکاتەوە و هەسەلەی
میللی لەسڵەن تە زعیف دەکات. حیزبی دیموکرات
کە هەسەلەی میللی بە دەستەوەترتووەو هەسەلەی
تەبەقاتی وانیڵێ دەکات وەکە بە هەفتەیێکدا

nîstî Îran, meseley tebeqatî zil dikatewa we meseley millî eslen tezîf diket(Komele, ya ku navê Partî Komonîstî Îran li xwe kiriye, pirsa çînî kiriye amanc û pirsa netewî li paş hîştiye). Hizbî Dêmokrat meseley millî bi destew girtiwe we meseley tebeqatî(çînî) wanîk diket we bi ħeqîqet mesele ew e, ku şêweyekî xwedîtin û xurûr û xo miħwerbûnî ye, ew e ku her kes dixwaze hertişt di bin dest wî de be. Li Kurdistanî Îran hindek ħizib û sazmanek heye eslen çawî ewey nabîne ku kesekdin tiştek bi xilafî eweybibêje. Bi min wa ye, eger nabesamaniyek li Kurdistan heye hemî ji wan e, lê belê gelî Kurd wek millet, hemû terefdarî eweye ku mubarezeyekî waħid(têkoşîneke hevgirtî) bêt û li yek sef de berëleyî Xumeynî bin û hemû bo rizgarî milletî Kurd mubareze bikin. Ew ixtilafî ku êsta heye, hemû sazmanî(rêxistinên) siyasiyekan dirust dikin, ne ku milleteke; îllet jî ew e, ku bi rastî ew sazmanana (rêxistinên siyasî) dûr in ji waqi-îî camiëy Kurdistan, ewey dihêlin, ewey dikin li gel camiëy Kurdistan rêk nakewê. Beşbeşbûnî milletî Kurd tasîrekî zor heye ku Kurdistaniyekan yeknagrinewe.

* Berê, li zemanî Şêx Obêdella we lizemanî mîrekanda hêçwextekî meseley xudmuxtarî(otonomî) metreħi nebûwe. Min nameyek dî, ku xelkî Sablax, cemaëtekî zemanî Şêx Obeydulla nuwîsîbûn bo Tzarî Rûs, ku em dixwazin musteqil(serbixwe) bin, şikayetiyan li dewletî Îran bû. Ji Tzarî Rûs xweztibûn ku alîkariya wan bike bo sexwebûn. Ew mesele her li dewranî şêxekan da, li dewranî mîrekan da hemî wek millet, wek rizgarî qiset lê kirawa. We eslen qise ne ew bû ku Kurdistanî koy rizgar bibe, yan Kurdistanî koy rizgar nebe, Kar bo hemû

ئەوەیە کە نەوعێک لە خودخوالی و غرور و خۆ
میوەر بینی ، ئەوەیە کە کوللی کەسێ دەبەدڵ
هەموو شتەکە لە ژێر قەبزەی ئەودا بێ .
ئێمە دەزانین لە کوردستانی ئێران بەعزە
حیزب و سازمانێک هەیە ئەسڵەن چاوی ئەوەی
نابینێ کە کەسێک بەبێ شتێک بڵێ بە خیلافی
ئەوەی کە ئەو گوتوویەتی . پێم وایە ئەو
نابەسامانیەیە کە لە کوردستاندا هەیە هەموو
لەوانە ، وەک ئیلا کورد دەڵێ میللەتە هەمووی
تەرەخداری ئەوەیە کە سوبارەزەکی لە یەک
سوبارەزەی واحیدا بێت و لە یەک سەوزا
بێت و بەرەکەلیی هۆمەینی بن و هەموو
بۆ بژگاری میللەتی کورد سوبارەزە بکەن . ئەو
بێختیاتەی ئەلعامە هەیە هەموو سازمانە
سیاسیەکانە دروستی دەکەن نەڵێ میللەتەکە .
میللەتەکە ئەوەیە بەڕاستی ئەو سازمانانە
دووبەرە لە واقیعی جامیعەی کوردستانە ،
ئەوەی دەیڵێن -- ئەوەی دەیکەن لەگەڵ جامیعەی
کوردستانە رێگەی ناگرێ .

بەشێ بەشی بووی میللەتی کورد تەشێڵی
زۆری هەیە کە کوردستانیەکانە یەک ناگرنەوە .
لەو گوزەشتەدا ، لەزەمانی شێخ عبیدالله و
لەزەمانی میرەکاندا هیچ دەستێک هەڵی
خودموختاری لەئارەق نەبووە ، ئەمن نامەیەکم
دی کە خەڵکی ساباخ ، جەماعەتێکی زەمانی
شێخ عوبەیدوللای نوودەسیبوبانە بۆ تزاری
ڕووسیا کە ئێمە دەمانەوێ مستەقل بین ، شکایەتیانە
لەدەوڵەتی ئێران بوو - دەربەدەر ، کراوین ، داوایانە
لە تزاری ڕووسیا ئەوە بوو بە دادیانە بگا و ئێمە
ضیاتی دەکەین کە مستەقل بین . هەسئەڵەی کورد
هەر لەدەورانی شێخەکاندا لەدەورانی میرەکاندا
هەمیشە وەک میللەتەوەک ڕزگاری قسەی
لێ کراوە ، وەئەسڵەن هەڵەدە نەبووە کە
کوردستانی کوێ ڕزگاری و کوردستانی کوێ -

Kurdan dikirin, hema bidaxewa(mixabin) di ew çel-pênce salên dawîn da ew kelîmey ne muqeddes hanîne ser zimanî milletî Kurd û li hemû şûn teblîx boy kira: xudmuxtarî! Bi êqlî min, divêt her tişt were kirin, bo ew kelîmey xudmuxtarî di qamûsî siyasî(ferheng)milletî Kurd de bikujêt û nabê bibêt(ev bêjeya 'otonmî' divêt ji ferhenga siyasî ya gelê Kurd rabe û neyê bikarhanîn). Zor li me zirar kirdiwa; xudmuxtarî tiştek niye, bidrê, yan bistindrê, ne dindrê, ne distinrê(otonomî tiştekî hel nake), çunku eger dewletek bibêt belê, tu bi zimanî xwe bixwêne, îdaratî miellî bi dest xo bê, hemû tiştekî bidê te, emma(lê belê) çunkî îqtîsadeke(okonomî/aborî) li ber destî dewletî merkezî ye, erteşeke (hêzên leşkerî) li ber destî dewletî merkezî ye, her wextê dewletî merkezî ger bixwaze, dikare her tiştî ji dest te bigre. Li zor cîhke xudmuxtarî heye. A nuha li Kurdistanî Îraq, ew e xudmuxtariye, ka bo çi gelî Kurd razî niye û her dawa diket? Ewa niye gelî Kurd li Îran ji çel sal zêdetir e bo xudmuxtarî xebat dike û hêç bi tiştekî negîştiwe?

Me weqa şêhîd dane, eger bo istiqlal(serxwebûn) dabaya, eger bo azadîman dabaya, em nuha azad bû bûn. Ewcar xelq jî li serit naketewa; Eger tu li nuqteyekî Kurdistan dawî istiqlal bikît we alay azadî û serbixoy helgirî, heddî eqel(bi kêmasî)bîst dewlet heye belkî ku pişt te bigre, belam çunkî mesele

گارەکە بۆ هەموو کورد ئەگرا، ئەما بەداخەوە
لە دەورەی ئەخیری چل پەنجا ساڵی
دوواییدا ئامانجو کەلیمە نا سوتەوەسی ی
"کە موجاهدینی پێی دەڵێن مقدس" هزایە
سەر زمانی میللەتی کورد و لەهەموو شوێنێ
تەلیفی بۆ ئەکرێ (خود موختاری)، بەحەقی
من ئەوە هەڵێیەو ئەبێ سەی بکرێ ئەو
هەڵێیە جوبان بکرێتەوە و ئەسڵەن کەلیمەی
خود موختاری لە قاموسی سیاسی میللەتی
کوردا بکوژرێتەوە و نابێ بێت. زۆرمان
زەرەر کردووە، خودموختاری شتێکی نیە
بدرێ یان بستێنرێ، نەدەدرێ نەدەستێنرێ
چونکی ئەگەر دەوڵەتێک پێت بڵێ ئەتۆ بۆخۆت
بەزمانی خۆت بخوێنە، ئیدارەی محلی خۆت بۆ
خۆت بێ - هەموو شتێکت بداتێ، ئەما
چونکی ئیقتصادەکە لەبەر دەستی دەوڵەتی
مەرکەزیدایە، ئەرتەشەکە لەبەردەستی دەوڵەتی
مەرکەزیدایە، لەهەرکوێیەک ئیقتصادو
ئەرتەش، لەشکر، نیزۆی حەڵێ لە ئیختیاری
دەوڵەتی مەرکەزیدا بوو هەروەختێ ئیشتیهای
لێ بێ لێت دەستێنێتەوە. لەزۆر جێگە
خودموختاری هەیە، ئەڵمانیا لەئیڕاق ئەوە
خودموختاریە کەچی تەلی کورد رازی نیەو
هەر داوا دەکات، ئەوەی هەیە لەئێران تەلی
کورد پەنجا ساڵ زیاترە بۆ خودموختاری
هەیات دەکات و بەهیچ شتێک نەگەشتوە.
ئەوەندەی ئێمە شەهیدمانداوە ئەگەر بۆ
سەربەخۆیی داوە ئەگەر بۆ ئازادیمانە
داوایە، ئەگەر بۆ ئازادیمانە
داوایە ئەڵمانیا ئێمە ئازاد بوودین. ئەوجا
هەڵبەتە لەسەرەتا ناکاتەوە. ئەگەر تۆ
لەنوقتەیەکی کوردستانەوە داوای سەربەخۆیی
یەکپارچەو ئازادی بۆهەمو کوردی، هەددی
ئەقەل بیست دەوڵەتی واهەیە پشتیوانیت
لێ دەکات، دە دەوڵەتی واهەیە پشتیوانیت لێ دەکات

meselekî daxilî(hindir) ye, kes xo li ser piya û xerab naket.

Min li mêj e, pênc-şeş sal e, ku gîştime ew qenaët, xudmuxtarî ne tiştek e.Ya dibê milletî Kurd xebat neket, danişê li malî xoy we teslîm bê, yan eger xebat diket bo rizgarî biket.

üzrî ê wan ew e, ku xwaztina veqetê dibe sedem, ku ew me hemûyan dikujin. Ma ew vî tiştî êsta nakin? Gund û bajar wêran nekirine? Xelk ne kujrawe, xelk derbeder nekirawe??? Eger bo istiqlal bûya ew her ew bi me dihat. Hema bi kêmasî li mesreñî cîhan da ê xuya ba Kurd wek milletekî xebat dikin, lê a nuha Kurd wek milletek xebat naket, wek beşek li Îran xebat diket, wek beşek li Îraq xebat diket. Kurd wextek detwanî(dikare) heqî xoy wergirê, ku wek milletek bête sañeyê û bibê, min milletekî bîst milyon, bîst û du milyon im, millet im millet, serzemînî xom heye, zimanî xom heye, iqtîsadî xom heye, ferhengî xasî xom heye; wek milletek zulm li min tê kirin; û ewana ku Kurdistan di bin destan da ye bi dagirkeran bizane, ne bra. Eger bra ye çima heqit nadê te?!! Eger bra ye bo te dikujê?! Na wella, dagirker e, işxalker e û hêş ferqî wî niye ji îşxalkerekî din!

Nahêle bi zimanî xo tu qise bikî, bi zimanî xo tu bixwênî!

Bi bîr û bawerî min, mixabin, sazmanên (rêxistinên) siyasiyekanî Kurdistanî Îran,

بەڵام چونکە مەسەلەکە مەسەلەی داخڵی یە کەسی خۆی لەسەری پیاوە خراپ ناکات وەکو سەبارەت لەژن دەوڵەتەکەی خۆی ڕێگە نادەن وەک ئێمە هیچمان ناڵێین .

من لە مێژە پێنج شەش ساڵ گەشتوومەتە ئەو قەناعەتە کە خودموختاری شتێکی نەگەیشتە ناسیۆنالیزمی نادروست وەک میللەتی کورد یاخود هاوبەشی نەکات ، داینەشێنێ لەمافی خۆی وەتەسلیم بێ ، یاسە نەگەر هاوبەشی دەکات بۆ ڕزگاری بکات. بەڵگەی دووەمیش ئەوەیە کە بە تەجزیە تەڵەبامان دەزانن و هێرشمانە دەکەنە سەرو دەمانکوژن. بۆ ئەمانە نەیانکردووە ؟! دێ وێرانە نەکراوە، شار وێران نەکراوە ، هەڵمەتی نەکۆژراوە ، هەڵمەتی دەربەدەر نەکراوە ؟؟؟؟ خۆ ئەگەر بۆ ئیستقلالیش بوایە ئەوە هەر ئەوەمانە بەسەر دەهات. ئەمجاج بوو هەدی ئەقڵ لەسەرخۆ جیهانیدا دەیانگوت وەک میللەتێکی هاوبەشی دەکەن ، خۆ ئەمانە گوردە وەک میللەتی هاوبەشی ناکات ، وەک بەشێکی لە عێراق هاوبەشی دەکات وەک بەشێکی لە عێراق هاوبەشی دەکات کورد وەک هێزێکی دەتوانێ هەقی خۆی وەربگری کە وەکو میللەتێکی بێتە ساهەو دەڵێن من میللەتێکی بیست ملیۆنی .. بیست و دوو ملیۆنیم ، میللەتم میللەت سەرزەمینی خۆم هەیە ، زوبانی خۆم هەیە ، ئیقتسادی خۆم هەیە ، هەرهەنگی تایبەتی خۆم هەیە وەک میللەتێکی زوڵم لێ دەکرێ وەئەوانەی کە کوردستانیلە لەبەر دەستایە بەدایگیرکەرانە بڵێ نەوەی ڕا. ئەگەر بڕایە ئەی بۆ هەتا ناوەتێ! ئەی ئەگەر بڕایە بۆ دەتکوژێ - بۆ دەبڕێ !! ناوەڵا دایگیرکەرە ، ئیشغاڵ کەرە وهیچ هەڕەشەیکی نایە لەتەڵ ئیشغاڵ کەرێکی دێکە . ناهێڵێ بەزمانی خۆت قسەبکەی بەزمانی خۆت بخوێنی ..

من بۆخۆم هەقیدەم وایە کە پێویستە لەهەڵوێستانەی کوردکە ئەمانەش بەواتەوە زۆر لەسازمانە

wek Ħizbî dêmokrat we Komele, Farisekan bi xwe jî Îranî ninin wekî ku ew Îranî ne, ne wekî ku Qasimlo, ya ewê din Îranî ne. Eqer millet î, eger waqiën(rast) xwe millet dizanî, wek millet dawa bike, yan na, çima hev dikujin. (Eger wek millet xebat bikî) ya te dikujin, asûde dibî, ya Ħeqî xoy digrî û ser dikewî.

* Kurdistanî Îran li zerfî ew heşt, noh, deh salan de xebat ku dest pê - kirdiwe, duwayî(li dû) rowiştinî Şah û hatinî rejîmî Xumeynî xebatekî zor fireh û gewre li Kurdistanî Îran dirust bûwe. Ewelen(yekem), li Ħeysî siyasiweye(ji halî siyasî de) pêşkewtinî fikrê xelqê, gelî Kurd, zor, zor pêşkewtiwe. Emin bi şehamet delêm(bi serbilindî dibêjim), Kurd li zerfî ew heşt-noh salî de bi qed(qasî) pênce salî pêş xoy pêşreftî fikrî we endîşe we rewştî ëqlî peyda kirdiwe; ëlletekeş ewe ye, pênc-şeş salan Kurdistanî Îran duwayî hatinî Xumeynî azad bû, belam ëĦzabî siyasî yek Ħizib nebû, da yek rê bo xelk nêşan bidin û bixête yek kenalewe. Efkarî cûracûr bû,...Eger efkarî cudacuda bû, hemû tiştan teblîx wan kird, xelk hişartir dibe, bo xoy fikrî ku şad dibê û li Ħeysî teslîmnebûnî li muqabilî dewlet da, teslîmnebûnî siyasî, her

سیاسیەکانی کوردستانی ئێران وەک حیزبی دیموکرات و کۆمەڵە وا بە ئێرانەوە هەیە هەستیونەتەوە فارسەکان بۆ وەک نەتەوەیەکی ئێرانی نین ئەوەندەی قاسملو ئێرانیە یا ئەوەندەی ئەوی دی ئێرانیە. ئەگەر میللەت ئەگەر واقعەنا هەبێت بە میللەت دەزانی وەک میللەت داوا بکا جا بتکۆژنە یا دەتکۆژن و هەڵاسی دەبی، ئاسودە دەبی یا بە هەق هەبێت دەگەیی و سەر دەکەوی.

* کوردستانی ئێران لەزەرفی ئەو هەشت نۆ دە ساڵەی هەبات کە دەستی پێ کردووە دوای رۆیشتنی شاو هاتنی رژیمی خومەینی هەباتێکی زۆر وەسیاو گەورە لە کوردستانی ئێران دروستبووە. ئەوەڵەن لە هەیسی سیاسیەوە، پێشکەوتنی فکری خەڵقەوە گەلی کورد زۆر، زۆر پێشکەوتووە. کەمن بە شامەتەوە دەڵێم کورد لەزەرفی ئەو هەشت نۆ ساڵەدا بە قەد پەنجا ساڵی پێشوەختی پێشڕەفتی فکری و ئەندێشەو رەوشتی عەقڵی پەیدا کردووە، عەیلەتەکەشی ئەوەیە پێنج شەش ساڵە کوردستانی ئێران دوای هاتنی خومەینی ئازاد بوو، خومەینی زاڵ نەبوو بەسەریا وەک ئەوەی سیاسی تەواوی لە ژێر باڵی حزبا نەبوو یەک ڕێگە بە خۆی بدا و بیخاتە ژێر کەنالەوە. ئەندێشەکار و ئەفکاری جۆراوجۆر بوو چەپی توندڕەو بوو، میللی زۆر، توند بوو، میللی وانێک بوو. لە ئەسڵی ئەفکارو عەقایدێکی ئەندێشەی جۆراوجۆرەوە ئازادیەکی هێنایە کایەوە کە ئەندێشەو بەیان بوو لە ئەسڵی ئەوەیا فکری هەڵقی بزوت، چەکدار بوو. ئەمەش لە ئەفکاری جۆراجۆر بۆ هەموو شتێک بە کەنالەکە گوت هەڵگە هۆشیارتر دەبێ هەی ئەویش دەبێتە، هەی ئەویش دەبێتە فکری ئەویش دەبینێ، هەی ئەویش دەبینێ، بۆ خۆی فکری گوشاد دەبێ و لە هەیسی نەسڵیم نەبوو لە موقابیلی دەوڵەتدا، نەسڵیم نەبوونی سیاسی

ew bîrûbawerî azadî ye, ku nehîştiye rejîmî Xumeynî li Kurdistan payegay bibe(bi ser neketiye),yanê cêpêyekî niye ku bibêtewe, li gel ew jî xelk kuştiwe, îdam kirdiwe, pêşmerge jî rawnawe; erê musellet kiriye ta ĥidûdek, ema nikaribûye tesxîrî fikrî xelq biket. Ji hêla çekdarî da mubarezekî zor gewre li gel rejîm kirdiwe, beynekî(demekê) şerekî cebhewî bû, ne partîzanî. Çar-pênc sal dewlet herku yek dibû pêşmerge lêy dida û pirraniya şûnan di destî pêşmerge de bû. Paşen ku dewlet musellet bû, cengî partîzanî dest pê kir; dîsa jî pêşmerge dikete kûranî Kurdistan, ta diçe Sablax, ta diçe Sene meselen. Xelk êşarêtewe, nan didinê. Diçin şûnên ku paygay dewlet lê heye, xelk wan di malan da vedişêre.

(...)

Ew fidakarî ku Kurd kiriye li Kurdistanî Îran bi rastî ji Vêtnam, ji Cezayir û ji her nuqteyekî dunya ne kêmtir e. Meëziretek(kêmasiyek) hebe ew ya hêzesiyasekan e, ku nizanin çon xwe li xelk wînin. Xelk zemîne amade ye.

Min li ser ta serî Kurdistan da, li Kurdistanî Tirkeya, li Kurdistanî Îraq emin şoreş bi zindû dizanim, millet, millet, min millet delêm(ez li ser millet dibêjime), qise bi sazman

هەر ئەو ئازادی یەردباوەڕو عەقیدەیە بوو سەبارەت
بەوەی کە رژێمی خومەینی لە کوردستاندا پایەداری
نەبێ، چونکە پێیەکی خایە کە بیبێتەوە، لەگەڵ ئەوەشدا
هێزێکی گوشتوە لێیدەی کردووە پێشمەرگەی هاوشێوەی
موسڵمانی بوونەتە وەک نیزامیا بەسەر کوردستاندا
تا هەرودێی، ئەمما نەیتوانیوە تەسخیری هزڵ
بکات. لەهەمیش چەکدارییەوە موبارەزەیەکی زۆر
تووڕەکراوە لەگەڵ رژێم، بەپێنجی شەڕەکە جەماوەری
بوو نەک پارتیزانی. چوار پێنج ساڵ دەوڵەت لە
هەرکوێیەک بوو پێشمەرگە لێی دەدا ئەگەری
دێهاتگاهەبە دەستی پێشمەرگەوە بوو؛ پاشان
کە تووڕەدە تووڕەدە دەوڵەت موسڵمانی بووە جەنگی
پارتیزانی شروعیا بوو کە سێ ساڵ ئەبێ ئەسڵەن
پێشمەرگە ئەگاتە عومقی کوردستان و دەچێتە سایلاخ
دەچێتە سنە مەسەلەن، هەڵێ ئەپارێتەوە
نانی بوونێ. کە دەچێتە دەرەکی پایگای دەوڵەتی
لێی بێ هەڵگرکە شوێ لەماڵەوە دەپارێتەوە. ئەمن
لە موجاهیدێکم پرسی گوتم ئێوە بۆ ناچنەوە
شیمالی ئێران، مازندەران و ئەو ناوە بۆ خۆتان
لەوێ جەبهەیەکەنەوە و بۆ هاتوونەتە کوردستان؟
خۆ ئەزانن لە شیمال نفوزتان بەکجار زۆرە.
ئەوە جێی ئەو موجاهیدە بوو ووتی هەڵەیەکی
پێت وایە ئەوە کوردستانە! ئێمە تا نفوزمان
هەیە لە شیمال ئەگەر، دەچینە دەرەوەی لە ئەڕاقی
مازندەران و ئەو ناوە، دەبێ لە پێشدا چین و
ئەحقیقی بکەین بزانین دۆستەکەمان لەو دەرەیە
کێیە چینە مانۆڕی. ئەمما لە کوردستان دەبێ
ئەحقیق بکەی کێ خراپە لەودەرەیە ئەچیە هاتی.
ئەوە جێی کارایەکی موجاهیدە. ئەو فیدا کارییەی
کە لە کوردی دەتێڕانەوە لە کوردستانی ئێران بەڕاستی
لە ڤیێتنامیش و لە ئەلجەزائیریش و لە هەر نوقتەیەکی
دنیادا هەر ئەوەیە.
هەعزەرەتێک هەبێ ئەوە لەهێزە سیاسیەکانەکە
نازانن چۆنە خەڵکەکە وەبار بێنن. خەڵکێ زەمینەیەکی ئامادەیە

nakim(gotina min ne li ser rêxistinane), millet nuha ji hemû wextên din amadetir e, çunkî derkî xoy kirdiwe(di xwe derxistiye, xwe nas kiriye). Muşkiley(gelş,problêm) gelî Kurd ew bû, ku nedizanî ew millet e û heye û heqî divê(xwedan maf e), de na, li mêj bû milletî Kurd istiqlalî ebû(ger ne wisa bûya ji mêj gelê Kurd rizgar bû bû). Hema êsta(lê nuha), milletî Kurd diza-.ne ew millet e û zulm lê dibe û dagir egrê(mêtîngeh bûye). Gotin ew e, ku xud-muxtarî pê hêç niye, êşarey ruşd e(oto-nomî li xweşiya gelê Kurd nayê û xwaztina otonomiyê nêşana neçariyê-zeîfbûnê- ye). Min pêş deh sal wer dizanî xudmuxtarî he-mû tişte, belam êsta(lê nuha) tê gihîştim ku hêç niye. Li Kurdistan yek muşkile he-ye, yek muşkiley ku bi ëqîdey min(bi bawe riya min) her grîng e û esasî ye: rêyek ku Kurd pêda biron bo hedefekî(riyake ku gelê Kurd tê de bo amancekê pêşve here), kesekî xelk nexistiye ser ew rê ye. Ger Kurd millete,rizgarî pê divêt, divêt wek millet xebat biket; divêt hizbek, yan saz-manek hebê, hedefî rizgarbûnî Kurd be. Hema bidaxewa (lê belê mixabin) hindek kes hene, dixwazine tewawî cîhan rizgar bikin, karkerî cîhanê hemû rizgar bikin, emcar Kurd jî rizgar dibêt! Kuro kaka, Kurd milletek e, wek millet zulm lê dibe.

*Tenzîmî KOMELE sazmanekî rêk û pêk û munezem bû, yanî sazmanî Inqilabî Zehmetkêşanî Kurdistanî Îran bû, gellek kurên baş di ew

من لم سەرتاسەری کوردستانەدا، لم کوردستانی تورکیا،
لم کوردستانی عیراقا خۆپرسی بە زیندوو دەزانم
هیلەت.. هیلەت، ئەو هیلەتە دەلێم قسە بە سازمان
ناکەم، هیلەتی ئەلمانیا لم هەبوو وەختێک ئامادەتر
چونکی دەتکی خۆی کردووە. موشکلی هیلەتی کورد
ئەوەبوو کە نەیدەزانی هیلەتە و هەیە و هەقی
دەوێ، دەنا لەنێو بوو هیلەتی کورد ئیستقلالی
ئەبوو. ئەو وەختە لەشەری یەکەمی جیهانیدا
خۆی دەولەتەکانە نەمابوون، هەموو نوولبوونەوە
هیلەتەکی هەستی بەوە نەکردبوو کە موجودێکە و
دەبێ ئیستقلالی هەبێ. ئەما ئیستا کورد
دەزانێ هیلەتە و زوڵمی لێ دەکرێ و دایگر ئەکرێ،
هی ئەوەیە کە خودموختاری بۆ هیچ نایەتە ئەوە
ئیشارەی پێدەدە. منداڵ سالێ لەوەوپێش
وام ئەزانی خودموختاری هەموو شتێکە، بەڵام
ئیستا تێگەیشتووم کە هیچ نایەت. بۆ هەر
جۆرە لەنێو کوردستانەکەی ئەمڕۆماندا بە خودموختاری
دێ، لم کوردستانەی ئێمە موشکیل هەیە بەڵێ موشکیل
بەم عەقیدەیەی من کە موشکلەیەکی هەرە گرنگ و ئاساسی یە
بۆ ئێمەی کە کورد بۆیا بڕوات بۆ هەدەفەکەی-
هەرگیز هەڵنەگرێ نەخراوەتە سەر ئەو بڕیارە- کە کورد
هیلەتە دەبێ رزگاری بێ، دەبێ هیلەت خەبات
بکات، خێزبێک یان سازمانێکی هەبێ هەدەفی
رزگاربوونی کوردبێ. ئەگەر بڕوانینە وەزعی
هەرێمێکی وەکو ئێران، لەنێو هەموو رزگاریخوازەکانی
جیهاندا هەموو رزگاریخوازێک ئەچێ کورد رزگاری
بکا. کورەکەم کورد هیلەتێکە دەبێ هیلەتە
زوڵمی لێ دەکرێ.

تەنزیمی کۆمەڵە سازمانێکی ڕێکخراو و موتەشەکیل بوو
یەعنی سازمانی ئینقلابی زەحمەتکێشانی کوردستانی
ئێران بوو. زۆر لەگەڵ باسەکەمان دابوو.
ئەگەر بڕوانینە بوونی کۆمەڵە بە خێزبی کۆمۆنیستی
ئێران زەرەرمەند بوو لەگەڵ کۆمەڵە و لەگەڵ گەلی کورد.
خێزبی کۆمۆنیستی ئێران ئەگەر نا توانێ

sazman de bû, ema bi daxewa KOMELE kirin Hizbî Komonîstî Îran. Ew zerbeyek bû li Komele û li xebatî gelî Kurd. Hizbî Komonîstî Îran eslen netwanê(nikare) li Îran ruşd bikat. Milletî Kurd wek milletekî rizgar niye. Çawa diyar e, min nefyî mubarezeyî tebeqatî(çînî) nakim. Nefî ew nakim(înkar nakim), eger Kurd rizgar bibe, hêja ye ħukmatekî bi nefëî(bo sûdê) karker û zeħmetkêş û cotyar û feqîr hebe. Emma (lê) meseley eslî ew e Ku Kurd wek millet rizgar bibe. Erê, karkerî Îsfehen zulm lê dibêt, karkerî Kurdistan jî zulm lê dibêt, lê belê di navberî herdu zulm de ferq heye, ewa(karkerî Îsfehan) ferhengî xoy heye, dixwaze dewletê bo menfëtî xo biguhere, yê me hêç tiştekî me niye, divêt dirust bibin. (Loma) Ew duwana natwanin(nikarin) yek kar bikin. Ca min pê wa ye, Komele tundrewî kirdiwe, yanê wa pêşkewtiwe li gel, tev xelkê nehatiye. Ħizbî Dêmokrat, rast e daway meseley millî û mafî xudmuxtarî diket, hema(lê) Ħizbî Dêmokrat hemîşt dumbale reyî xelk e, ħizbekî pêşrew niye, sazmanekî rêk û pêk niye. Bi manekî din (yanê), Hizbî Dêmokrat li dûwayî xelkê diherêye(li paş gel maye), Komele jî zor pêş xelk kewtiwe we li xelk dûr kewtiwe. Bi ëqlî min, gewretirîn rexne ye li dunyayê em ro hukmî zatî metreħ bikî(bi dîtina min, mezintiriyên şaştiyê ew e, ku yek îroj daxwaza otonomî bike). Ez nabêjim ku ew herdu (Partî Dêmokrat û Komele) mubareze nakin. Pêşmergên wan jî hene, xebat jî kirdine, zerbeyî zor gewre jî li dewlet didin.

لە ئێران رۆشنبیران ناتوانێ لەگەڵ دەستەی رۆشنبیرانی کوردستان بکات. ئەوەی مەسەلەی کورد لێ ئێستە لایە مەسەلەی میللی یە، ئەوێ میللەتێک رزگار نی یە. جا دیارە من نەفی موبارەزەی تەبەقاتی ناکەم. نەفی ئەوە ناکەم ئەگەر کورد رزگار بێ کارگەر و زەحمەتکێش و جوتیار و هەژار هەکومەتێکی بۆ نەفی ئەوانی. ئەما مەسەلەی ئەسڵی ئەوەیە کە کورد وەک میللەت رزگار بێ. کارگەری ئێستە هاوکاری لەگەڵ دەکرێ یا کارگەری کوردستانیشا زوڵمی لێ دەکرێ. ئەمانە دوو زوڵمە جیاوازن لە یەک، ئەو حکوومەتی خۆی هەیە، هێزی خۆی هەیە دەیەوێ دەوڵەتەکەی بە نەفی خۆی بگۆڕێ. ئێمە هیچمان لێ نایە دەمانەوێ دروستی بین. ئەو دووانە ناتوانن وەکو یەک کار بکەن. جا من پێم وایە کۆمەڵە تواندەوی کردووە یەعنی وا پێشکەوتووە لەگەڵ هێزێکدا نایەتەوە. حیزبی دیوکراتە - حیزبی دیوکرات راستە دڵوای مەسەلەی میللی و خودموختاری دەکات، ئەما دیوکرات هەمیشە دومبارێی هێزێکی، حیزبێکی پێشڕەوی نایە سازمانێکی ڕێک و پێکی نایە. بە مەعنایەکی تر حیزبی دیوکرات لە دووای هەڵگرتنی دەبرێ و کۆمەڵێش زۆر پێش هەڵگرتنی کەوتووە و لە هەڵگرتنی دوور تر کەوتۆتەوە. وە ئەو جا ئەوەی کە حیزبی دیوکرات بە خودموختاریەوە نوورساوە کۆمەڵێش بە دواوە هەر ئەوە دەڵێتەوە. بە هەڵەتەی من تەوەرەی تازەی لە دنیای ئەورۆدا کە تازە هوکمی زاتی مەرگی بکرێ. من هەردەکیانم پێ هەڵە ناشێلم موبارەزەی ناکەن - پێشمەرگە ستیانە هەیە و هەبانیشیانە گردوو زەربەی زۆر گەورەش لە دەوڵەت دەدەن. ئەما پێشمەرگەی کۆمەڵێ وەک کوڕێکی جوانی ئەفلاەر چاکی رەفتار باشی موخلیس پێی دایە کورد رزگار دەکات خۆ جاڵی نایە کە هەموو کارگەری دنیا و ئێرانە رزگار دەکات پاشانە کورد رزگار دەبێ.

Pêşmergey Komele, wek kurekî ciwanî exlaqçakî muxlis, wacib bo wî ew e, ku Kurd rizgar bike; ne bibêje,hemû karkerî Îran û dunya rizgar bibin, paşen jî Kurd rizgar dibê.

* Di xelk da zemîne û ħazirî heye ku xebatê bike. Lê du muşkil li pêş me hene. Yekem, rêxistinên me yên siyasî, her yek bo xo xetek diyarî kirdiwe, hem Komele, hem Dêmokrat, hem ew û hem ew. Duwem, Kurd beşbeş e, ew beşbeşbûna meséle (yekitî û hevgirtin) bi rêk dûr xistitewe. Iħtiyac bi rewşenbîranî Kurde, nemaze ewên di siyasetî ew ħizban da kar bikin, bo teblîẍatî bo bikin, heta munezemeyekî wa wijûd bêt(rewşenbîr divên, ku di van partiyan de kar bikin û di wan de guhertinan çêkin, da rêxistinên rêk û pêk werin holê, û ev bo hemî beşên Kurdistan). Li nuxteyekî Kurdistan tiştekî wa dirust bibe, xwe li holê feriz bike û iëlanî mewcûdiyetek biket, werde werde yên din jî dibin(Ger li beşekî Kurdistan rêxistineke niştimanperwere waqiî were holê û bikaribe xwe li holê feriz bike û di xeteke dirust de siyaseta xwe pêşve bibe, hêdî hêdî, yên din jî ê wisa bikin). Hêviya min heye Kurd rizgar bibe. Êsta Kurdî hemî beşekanî Kurdistan derkî yek dikin(pişt hevûdin digrin). Caran Kurdî Îran derkî Kurdî Îraq nedikir, Kurdî Îraq derkî Kurdî Tirkiya nedikir. A nuha, Kurdî Îran ger biçine Îraq, herwekî ku biçine mala xwe. eger diçine nik Kurdên Tirkiya, herweha. A ew li yek nêzikbûna we derkî yekgirtin(pişt hevûdin-girtin) we tefahum, xwe wek milletek ħesabkirdin zor zor bo ew tişt(hêviya rizgarbûna Kurd) tasîr heye. Yanê meséle a nuha meséley millî ye di Kurdistan da. Meséleyî Îslam meséley roj niye, meséley komonîstî meséley

roj niye. Heqîqet ew e. Wek min li gel bramusilmanekanî Îraq li Sulêmanî qise dikir, gotim: kaka, bi xwedê ne Harûn al Reşîd zindû(saẍ) dibêt, we ne hukûmatî xilafey Îsalmî dirust dibê. Xerîtî milletî Kurd bin, herkes bo xoy nimêjî xoy diket. Em ji mêj musilman in, 1300 sal e musilman in. Li ser Îslametî kes me nakujê, kaka, wella li ser komonîstî jî nakujin, li ser kurdayetî me dikujin, kaka! Haşimî Refsencanî a diçe koy? Diçe Bulẍaristan, diçe Mosko, hema pêşmergakî Kurd digre, ëdam dike, ji ber ku ew Kurd e, ne ku ew komonîst e, kaka! Îcar bi ditîna min, divêt rexney hêzên siyasî were kirin, ne ku tev wan şer bikin, lê bibêjin, ku xudmuxtarî hêç niye, baba! Kaka, min çon hemî dunya rizgar dikim; karkerî Îran min çon rizgar dikim? Ew e noh sal e li Kurdistanî Îran şer e, şerekî zor gewre, ĥeta şerî du dewlet jî kettiwe Kurdistan. Bo çi xelkî Îran pişt şoreşî Kurdistan nagirin, bo çi Hizbî Tûde, yan filan, yan filan du hezar karker naşhînin Kurdistan muqabilî(li dij) Xumeynî şer bikin? Bo çi kesek milyonek tumen(dravên Îranî) bo Kurdistan naşîne? Eger milyonek karkerî Îran, her yek tumenek bide, dikarin bidin, de bo çi nadin? Bo çi(rejîmî Îran) pêşmerge li dû pêşmerge dikuje! Ma bo çi yekî Faris, yan Tirk nakuje? Diyar e, Fariseke şoreşî Kurdistan bo xoy nizane, kaka, herweha li Îraq jî, herweha li Tirkî jî. De bila hezar karker bêt, wellahî tifing jî didinê; herkes bo xwe îş dikêt!

Ew Faris û Tirkên diçin cebhe bo XUumeynî dikujin, bo çi ji Kurdan re nakin, ha?! Wek diyar e, wellahî

نوێژی هۆی دەکات . ئێمە موسڵمانین لەبەر
موسڵمانین ، ١٣٠٠ ساڵ موسڵمانین ، هۆ لەسەر
ئیسلام کەس ناماڵکۆڕێ لەسەر کوردایەتی
هەڵدێ دەماڵکۆڕێ گاکم .. واللە لەسەر
کۆمۆنیستیش ناماڵکۆڕم . ئاشتی ڕەفیقانی
ئەچێتە کوێ ؟ ئەچێتە بولغارستان ، ئەچێتە
مۆسکۆ باوەشیش بە گورباچۆڤ ئەگا و پیسیش
ناجێ ، ئەما پێشمەرگەی کورد دەگرێ ئیعدامی
دەکا دەڵێ پیس لەبەر ئەوەی کوردە ئەڵێ
لەبەر ئەوەی کۆمۆنیستە گاکم ! . جا من بەم
وایە ئەی موبارەزە لەگەڵ هەقی سازمانەکانیش
بکرێ ، یەعنی نەڵێ چین لەگەڵ سازمانە
سیاسیەکان بچەنگین بە گڵۆ فکرەکەیانەوە خەتیئەی
بکەین ، یەعنی هەر بەڕاستی بە هەڵێ بڵێین
خودموختاری هیچ ئایەتی بابەت . گاکم من چۆنم
هەموو دنیام ئەڕزگار دەکرێ ، کارگەرانی
ئێرانم چۆنم ئەڕزگار دەکرێ . ئەوە نۆ ساڵە
لەکوردستانی ئێرانە شەڕە شەڕێکی زۆر گەورە
هەتا ئێستا دوو دەوڵەتیش کەوتۆتە
کوردستانەوە ، شەڕی خومەینی لەسەر ئیلەتی کورد .
بۆ هەڵێ ئێران شۆڕشی کوردستانە ئەڵێید ناگەن
بۆ حیزبی تودە یان فلانە - فلانە بۆ دوو
هەزار کارگەر ناهێنە کوردستانە موقابیلی
خومەینی شەڕ بکەن ! بۆ بە ملیۆنە تومەن
خەرج ناکێتەوە بێنڕێنە بۆ کوردستانە . ئێران بەڵێ
ملیۆنە کارگەری هەیە بۆ هەر یەکێ تومەنێک کۆ
ناگەنەوە ؟ یەعنی بۆ ناگەن ؟ بۆ هەر
پێشمەرگەی کوردە یا دەکۆڕێ یا دەکوژێ !
بۆ لەفارس ناکۆڕێ ، بۆ لەتورک ناکۆڕێ !
دیارە لەئێران فارسێک سوبارەزەی کورد بەهەی
هۆی نازانێ گاکم . ئێمە لەهۆڕا باوەشمان بۆ
کردۆتەوە واللەی بەهەی هۆی نازانێ ، هەروا
لەبیرانیش هەروا لەتورکیەیش . یەعنی بەڕاستی
دەیا دە هەزار کارگەر بێت واللەی تفەنگیش دەدەنێ

her Kurd e ku şer diket, her Kurd e ewî xebat diket, her Kurd e ewî nan dide, ewî xizmetî pêşmerge diket, her pîrejin û xûşk û dayikî Kurdekeye ku xo perîşan dikin û xo didin ber hezar xeter bo alîkarî pêşmerge bikin. Kaka, wek milletekî zulm li Kurd dibe û zulmî lê kirawe nehatiye serî kesî. Divêt bo xoy bî, bo xoy!

Tecrîbe nêşanî dawe. Hizbî Komonîstî Iraq, Hizbî Tûdey Îran zor nanî milletî Kurd xwardiwe, paşên dijminayetî Kurdan kirdiwe. Kurd madam dixwaze bijî, divêt wek millet xebat biket, we yan neket. Bi min xoşe hemû karkerî dunya rizgar bibe we mutteĥid(hevgirtî) be, bi min xoş e seädet(şahî) bo hemû xelqî cîhan bêt, bi min xoş e hemû kes li cîhan azad bêt, belam ew şiära bo min gewre ye, min natwanim ew şiära hilgirim. Ez dibêm, Kurdistan beşbeş kirawe , milletî Kurd beşbeş kirawe(ji hev veqetandine). Divêt milletî Kurd yek bigrêtewe(bi yek be), serzemînekeyek bigrêtew(welatê xwe bi dest xe), milletî Kurd , her bîr û bawerîkî heye(bi hemî bîr û baweriyan) di sefekî hevgirtî de li ëley(dij) dagirker û dijmin xebat biket.

بۆ هێزێکی دەکەین . هەموو ئەو خەباتەی
تۆڕەکە دەچنە هەموو بۆخۆمان دەکۆڕێن
بۆ ڕاناگەن بۆ کوردستان ... هتد ! شتەکە دیارە
واللهی هەر کوردەکە یەکی ئەوی شێوە دەکات
هەر کوردەکەیە ، ئەوی خەباتە دەکات هەر
کوردەکەیە ئەوی ناهەقی دەداو خۆمەتی پێشمەرگە
دەکات هەر پیرێژن و خوشک و دایکی کوردەکەیە
ئەوی هەڵدەستێتەوە و تووشی هەزارانەهەتەر
دەبێ پێشمەرگە دابین دەکات ، کاڵەکورد وەک
میللەتەخەباتە دەکا و زۆری لێ ئەکراوە و کەسی
لەسەری نیە و دەبێ خۆی بۆ خۆی بێ .

تەجرەبە نیشانی داوە هیزی سیاسی عێراقی ،
هیزی تووندەی ئێرانی زۆر نانی میللەتی کوردیانە
خواردووە پاشان دوژمنایەتی کوردیانەکردووە
کورد مادام بیەوێ بژی دەبێ وەک میللەت
خەباتەکات وەئیلا نەبێکات .

پێم خۆشە هەموو کارگەری دنیا رزگاری بێ و
سوتەمەنی بۆ ئێمە هێنا نەکرێ ، بەڵام من ئەو
شێوەیە بۆ من زۆر تەورەیە من ناتوانم
ئەو شێوەیە هەڵگرم ، من دەڵێم کورد میللەتێکە
کورد بەشێوەیەکراوە ، کوردستانەیەکە
زەمینەیەشێوەیەکراوە ئەبێ میللەتەکە
یەکی بگرێتەوە ... زەمینەکە یەکی بگرێتەوە و
هەموو میللەتی کوردیش هەر بیرو باوەڕێکیان هەیە
ئەبێ لەسەر ئەنگی خواجیدا پێکەوە بەرەی یەکی
دانێکەوە دوژمن خەباتبکات .

(هەڤپەیڤین لەگەڵ ش.ب. سورەکلی :
(1988/6/9